

Dumahîk : Gotina....

ku tevgera kurd bêtir hişyar be , da ku bi hêsanî , kurd nekevîne zîkê pîlan û xefkên siyaseta navnetewî ya ku bawerî pê zehmet û tehlûke ye . Astengî û rewşa zor taybet û awarte , ya ku Sûriya ev e 11 heyvin tê de dijî û dikele , rojane bi dehan kuştî , birîndar û bi sedan girtî dibîne qurban hwd , bê guman rijîma Be'is , karbedestîya sîstema yekpartî – modêla Şawşêsko – di ber de berpîrsiyar e , û segermî , tund û tûjî – ji kîjan hêlê de dibe bila bibe – wê tu caran rê li ber çareserîyeke siyasî veneke . Di vî warî de , kurd duh jî , îro jî , ne bi gurkirin , tund û tûjî yê re ne . Bikaranîna hestên dîn-deyanetê , bona siyaseta û berjewendiyan , li ba pîraniya kurdan li Sûriyê , ciyê şermezarî û xemgîniyê ye , ji ber ku ev yeka he , netenê yekîtiya civaka Sûrî birîn dike û ji hev dixê , lê belê , rê li ber guhartina demokratîk û çareserkirina pîrsa netewî ya gelê kurd dixetîmîne.

Rastiya tabloya civakî ew e ku gelê Sûrî , ji bilî pîrsa herdu netewayetiyan sereke , erebperwerî û kurperwerî , dixuyê ku mijûlbûn û gizgizî bi hêla pîrsa mislmantiya Sunnî , Elewî , Durzî û Îsma'îlî , ji bilî taybetmendiya rewşa biraderên Fille ve , tête xebitandin , digel navnîşanên dî mîna Eşîrperstiyê ... hwd . Kurd di vê derbarê de , bi siyaseta û helwestên xwe , bi giranî û çalakîyan xwe yê pîvayî , di parastina yekîtiya Sûriyê de bûne stûneke bîngêhîn , ji ber ku , bawerî her li cî ye ku , parastina jiyana û berjewendiya gelê kurd û çareserkirina pîrsa wî ya netewî , her dê di çerçewa yekîtiya Sûriya û jiyaneke demokratîk de be , jiyaneke ku mafên mirovan tê de bêne parastin û binpê nebin , rûmet , azadî , maf û wekhevîya gelan bêne rêzgirtin.

Li dawî , supasî digel rêz û hurmeta

serokatî û hikûmeta herêma kurdistanê re , ku karîbûn rê bidîne lidarxistina konferansekê weha , û jê re piştgir bin . Supasî digel rêz û hurmeta ji kar û barên komîta amedekar re . Serkeftin ji doza Aştî , Azadî û Wekhevîyê re Ji doza gelê kurd a dadmend re ...

Birayê we

Mihyedîn Şêx Allî


Sekretêrê parta yekîtiya demokrat a kurd li Sûriyê. Heleb 26.01.2012

Gotina ku ji Konferansa kurdên Sûriyê li derve re birêbûye , yê ku li Hewlêr ê – Kurdistanê Îraqê hatiye girêdan di 28 – 29 . 01 . 2012 an de , û wa hîngê ketiye destê dîwana serokatîyê da ku bibe ji belgên konferans

Her çar demjimêran yek îdam

Federasyona Navnetewî a Civakên Mafê Mirovan û Civaka Mafê Mirov li Îranê, di daxuyaniyek hevpar de ragihandî ku evsal, di her 4 demjimêran de kesek hatiye bidarvekirin.

Li gorî vê daxuyaniyê tenê ji 1 heya 8'ê Çileyê Paşîn a sala 2012'an 39 kes di bajarên cur bi cur ên Îranê de hatine bidarvekirin.



Di vê daxuyaniyê de herweha tevî baskirin ji derkirina hukmê bidarvekirinê ji bo Emîr Mîrzayiyê Hikmetî, Amrîkayiyê bi esla xwe Îranî, bi tometa sîxoriya ji bo Amerîkayê û herweha Ehmedrîza Haşimniya, Wehîd Esxerî û Seîd Melîkpûr gelaledarê jên malperên întêrnêti, qala zextên rejîma Îranê li ser girtiyan, bona wergirtina îtirafan ji wan hatiye kirin.

Li gor rapora lêborîna navnetewî, di 11 mehên sala 2011'an de pitir ji 600 kes di Îranê de hatine daliqandin ku ew hejmar li gorî îdamkirina aliyê kêma 553 kes di sala 2010'an de, hejmarek zêde û berbiçav e.

Ji kovara Agirî. H. 175